

HEGER TO JI KARÎ HATIBÎ DERXISTIN - EM JI BO TE HENE

Fonda ewlehiyê TSL temîneka belaş e ji bo wî kesî ji ber kêmbûna karî ji karî hatiye

derxistin. Ev îmtiyazek e ku li wan cihên karî heye yê ku xwediye peyman kolektîv [kollektivavtal] in. Ev temîn

alîkariyê dike ku tu karekê nû peyda bikî, şirketeka şexsî ava bikî yan jî dest bi xwendinekê bikî û di têkiliyên bi Kaseya temînê [Försäkringskassan] û daîreyên din re alîkariyê dike. Mimkin e bedela aborî (Alîkariya derxistinê)

û xwendineka pîşeyî ya kurt jî di vê temînê de hebe.

Tu dikarî bi pişgiriya em pêşkêş dikin xwe ewle his bikî:

- Em bi hesaba navincî salane alîkariya 15 000 kesan ji bo karî dikin
- Me di van 10 salên borî de alîkariya zêdetir ji 250 000 kesan kiriye
- Zêdetir ji 90% ji kesên ku em alîkariya wan dikin di mideta salekê de karekê nû peyda dikin

EV TEDBÎR WEHA BI RÊ VE DIÇE

1. Tu şewirkarekê vekarkirinê yê TSLê dibînî û ew agahdariyan derbarê îmkanên te dide te
2. TSL şirketeka vekarkirinê ya ku dê alîkariya te bike dibijêre
3. Alîkarê karî yê ku dê ji bo peydakirina karekê nû bi te re bixebite têkiliyê bi te re dike
4. Heger hewce bike, îmkan heye ku tu xwendinên pîşeyî yê kurt bixwînî
5. Heger tu di ser 40-saliyê de bî, mimkin e tu alîkariya derxistinê (AGB) bistînî

Fonda ewlehiyê TSL

tel: 010-480 91 00

epost: info@tsl.se

FAKTA

HEQÊ TE YÎ ALÎKARIYA VEKARKIRINÊ HEYE?

Temîna vekarkirinê ji bo te îmtiyazek e heger tu li cihekê karî bî yê ku peymanana kolektîv bi sendîkayeka LO-ê re hebe. Endambûn di sendîkayê de ne şert e.

Şert:

- Kardariya demnesinorkirî
- Kardariya ku 12 mehan li ser hev li şîrketekê yan çend şîrketan yê xwedî peymanana kolektîv dom kiriye
- Herî kêr 16 saetên karî di hefteyê de
- Derxistina ji karî ji ber kêmbûna karî be
- Hêj nebûye 65-salî

Agahdariyên zêdetir li ser temîna vekarkirinê di <http://www.tsl.se/jobsokare/> de

HEQÊ TE YÊ ALÎKARIYA DERXISTINÊ HEYE?

Alîkariya derxistinê AGB meblexeka yekcarî ye ku mimkin e tu bistîni heger

tu ji ber kêmbûna karî ji karekê demnesinorkirî hatibî derxistin. Ew meblex di sala 2019ê de li gor temenê te

di navbera 36 487 û 53 064 kronan de ye. Temîna AFAYê AGB tenzîm dike.

Şert:

- Divê te di van pênc salên borî de herî kêr 50 mehan kar kiribe
- Divê te li şîrketekê yan çend şîrketan yê xwedî temîna vekarkirinê xebitîbe
- Divê tu ji ber kêmbûna karî ji karî hatibî derxistin
- Divê temenê te di roja dawiyê ya kardariya herî dawiyê de bûbe 40 sal
- Tu bi xwe alîkariya derxistinê dixwazî
- Divê kardêrê te daxwaznameya te îmze bike

Di malpera Temîna AFAYê de agahdariyên zêdetir derbarê şertan bixwîne û daxwaza alîkariya derxistinê bike:

<http://www.afaforsakring.se/avgangsbidrag>